SERETAYÎ

# ZIMANÊ KURDÎ 3

## ***AMADEKAR***

Ev pirtûk, bi sûdwergirtina ji pirtûkên Mexmûrê, ji aliyê Komîsyona Pirtûkan a Rojavayê Kurdistanê ve hatiye amadekirin.

**Ev pirtûk, ji aliyê Desteya Perwerde û Fêrkirinê ve, weke pirtûka waneyê hatiye pejirandin.**

# NAVEROK

**BEŞA 1** ........ 5

AZAD Û DIBISTAN ........ 5
SIRÛDA ABECEYÊ ........ 7
ZAROKÊ XEMSAR ........ 10
MIJARA SERBEST ........ 13
AY LÊ GULÊ ........ 13
MORIYA BIÇÛK ........ 14
JIYAN ........ 16
WATEYA HELBESTÊ BI KURMANCIYA JORÎN. ........ 17
EZ PIRTÛK IM ........ 18
PIRTÛK ........ 20
MIJARA SERBEST ........ 22
PÊKENOK ........ 22
TEST 1 ........ 24

**BEŞA 2** ........ 25

TEMAŞEKIRINA TELEVÎZYONÊ ........ 25
HEVALTÎ ÇI QAS XWEŞ E ........ 27
MIJARA SERBEST ........ 28
EV E DINYA ........ 28
RÛMETÊN ME ........ 29
BÎSTANÊ BAVÊ GÊJO ........ 32
RÊZDARIYA JI MAMOSTE RE ........ 33
EFRÎN ........ 36
PARASTINA XWEZAYÊ ........ 38
PERPERÎK ........ 40
TEST 2 ........ 42

**BEŞA 3** ........ 43

GURÊ ÇAVBIRÇÎ ........ 43
XALÊ MIN Ê COTKAR ........ 46
XEBAT Û KAR ........ 48
PENDÊN PÊŞIYAN ........ 49
NAME JI BO DAPÎRÊ ........ 50
BERF NABÊJE EZ TÊM ........ 53
HEŞTÊ ADARÊ ........ 56
TEST 3 ........ 58

**BEŞA 4** ........ 59

ÇIMA NAKENE! ........ 59
ZAROK Û LÎSTOK ........ 61

NALÎNA KURDISTANÊ ........ 64
XWENDEKAREKE JÎR ........ 67
DARA GÛZÊ ........ 70
ÎKLO DÎKLO ........ 73
ZAROK Û GUL ........ 74
BIHAR Û ENDÎWER ........ 76
ÇEND ŞÎRETÊN XANÎ ........ 79
VEGERA LEGLEGAN ........ 82
XECXECOK ........ 85
TEST 4 ........ 86

**BEŞA 5 ........ 87**

MEHABAD ........ 87
XIFŞÊ ........ 89
ROVÎ Û GUR ........ 92
MIJARA SERBEST ........ 95
BILBILÊN DI RIKEHAN DE ........ 95
KULÎLK ........ 97
XWENDIN ........ 99
ALÎKARÊN COTKAR ........ 101
HEZKIRINA DAYÎKÊ ........ 104
KEW Û MIRÎŞK ........ 106
TEST 5 ........ 108

# BEŞA 1

## AZAD Û DIBISTAN

Azad serê sibê zû şiyar bû. Çû destşokê, dest û rûyê xwe şûştin. Taştê xwar. Diranên xwe firçe kirin. Cil û bergên xwe yên dibistanê li xwe kirin. Bi baldarî amûrên xwe yek bi yek di çenteyê xwe de bi cih kirin. Xatir ji dayîka xwe xwest û berê xwe da dibistanê.

Azêd gelekî bêriya dibistan, heval û mamosteyên xwe kiribû. Bi lez dimeşiya. Dixwest wan zûtir bibîne. Pir bi kelecan bû.

Dema ku ber bi dibistanê ve diçû, rastî hevala xwe Rojînê hat. Silav dan hev û bi hev re çûn dibistanê.

Hêdî hêdî baxçeyê dibistanê bi xwendekaran tijî dibû. Hevalên xwe yên sala borî dîtin. Hevalên wî jî hemû wekî wî bi coş û kelecan bûn.

Piştî wê bi lêdana zengilê re xwendekar li hev civiyan û ketin rêzê. Di vê navberê de refên wan ên nû ji aliyê mamoste ve hatin diyarkirin. Paşê her kesek bi rêk û pêk ket refa xwe. Azad jî ket refa xwe ya nû. Piştî çend xulekan, mamoste hat refê.




Mamoste:

-Rojbaş zarokno! Sala nû ya hîndarî û perwerdeyê li we pîroz be. Ez bi dîtina we pir dilxweş im. Min bêriya we kiribû. Piştî axaftina mamoste, Azad û hevalên xwe li çepikan xist. Rêzdarî û dilxweşiyên xwe pêşkêşî mamoste kirin.

## Wateyên Peyvan

**Perwerde:** Fêrbûn, hînbûn
**Kelecan:** Xiroş, peroş, heyecan
**Xwendekar:** Kesê/a dixwîne
**Xulek:** Deqîqe

## Em Têbigihin

1-Azad ji bo çi sibê zû rabû?
2-Azad dema ku ji xewê rabû çi kir?
3-Bêhnvedana we ya havînê çawa derbas bû? Bi çend hevokan binivîsin.

## Hîndarî


Hay ji van xalên li jêr hebin:

Pirtûk û lênûsên xwe berg bikin. Bi awayekî paqij bi kar bînin. Wan neqetînin û nequrmiçînin. Pirtûkên xwe xêz nekin. Heman baldariyê ji bo tiştên hevalên xwe û dibistanê jî nîşan bidin.

## Rêziman

1- Her peyveke li jêr di hevokekê de bi kar bîne:
Xwendekar - mamoste - dibistan - heval - azadî

# SIRÛDA ABECEYÊ




Bijî bijî Kurdistan
Rê girtî, me biçûkan
Va em diçin dibistan
Ji bo hînbûna ziman

Zimanekî şirîn e
Ciwan û hingivîn e
Abeya wê bixwîne
Sih û yek tîp bi cî ne

Heşt tîp hene şiyar in
Navê wana bideng in
Bîst û sisê xewar in
Tîpên girs û bêdeng in

Dibistana têkoşer
Hînbûna wana jiber
Kar û xwendin, zanewer
Mamostê me Dilawer

**a-e- ê- i- î- o- u- û**

**b- c- ç- d- f- g- h- j- k- l- m-**
**n- p- q- r- s- ş- t- v- w- x- y- z**

## Wateyên Peyvan

**Dilawer:** Mêrxas, dilovan
**Hînbûn:** Fêrbûn
**Têkoşer:** Xebatkarê dozê

## Em Têbigihin

1- Dibistan çi dide xwendekaran?
2- Zarok li dibistanê çi dixwînin?
3- Çend tîpên dengdêr û çend ên dengdar hene?

## Rêziman

***1- Di zimanê kurdî de 8 tîpên dengdêr hene.***
a- e- ê- i- î- o- u- û

***2- Di zimanê kurdî de 23 tîpên dengdar hene.***
b- c- ç- d- f- g- h- j- k- l- m- n- p- q- r- s- ş- t- v- w- x- y- z

***3- Ji rêzepeyvên li jêr kîjan hevok e?***

Rêgirtî
Va em diçin dibistanê.
Ciwan û hingivîn

-*Ji peyv û rêzepeyvên ku wateyeke tam diyar dikin re* ***hevok*** *tê gotin.*

Hevoka li jor di lênûsa xwe de binivîsin û li dawiya wê nîşaneya xalê ji bîr nekin.

## HÎNDARÎ

1- Dema mamoste helbestê dixwîne, li ser van xalan baldar bin.

- Li kû derê kêm û li kû derê zêde radiweste?
- Dengê xwe li kû derê bilind û li kû derê nizm dike?

2- Helbestê bi awayekî bêdeng bixwînin, naveroka helbestê fêr bibin.

3- Helbestê bi awayekî rast û bideng bixwînin. Dengê xwe baş bipîvin.

4- Valahiyên li jêr dagirin.

.... girtî me biçûkan
Heşt tîp ....şiyar in
Bîst û sisê ..............

## Têbînî:

- Dema hûn dixwînin bila di navbera çavên we û pirtûkê de bi qasî 30 cm dûrbûn hebe. Ji bo tenduristiya çavên we, ev pir pêwîst e.



## ZAROKÊ XEMSAR

Zarokekî xemsar hebû. Dema ku cilên xwe ji xwe dikirin davêtin erdê. Pirtûkên xwe li holê ji bîr dikirin. Li kû derê dilîst, pêlîstokên xwe li wir dihiştin.

Rojekê, tiştên wî yên belawela, di navbera xwe de dipeyivin.

Gore:

- Tu çima heya niha li virî? Ma ne diviya tu niha li dibistanê bûya?

Pirtûk:

- Belê, lê mixabin dema ku zarokê xemsar çû dibistanê, ez li vir hiştim.

Cil û gore jî ji zarok bêzar bûbûn.

Şal:

- Binêrin, hûn dizanin em ê çi bikin? Zarokê xemsar bilêta basê di berîka min de ji bîr kiriye. Em hemû bi hev re li basê siwar bin û ji vir biçin.

Tişt miştên wî, bi hev re dibêjin:

Erêêê!

Basa ku lê siwar bûn, ew birin seyrangeheke şîn.


Li wê derê bi gog û veşarkanê lîstin. Di nav axê de xwe gevizandin.

Ber êvarê dîsa li basê siwar bûn û zivirîn malê. Her yek çû cihê xwe.

Zarok ji dibistanê hat. Dema ku rewşa tiştên xwe dît.

Got: Xwezî min ew rakiribûna da neketibûma vê rewşê.

Zarokê xemsar ji wê rojê û şûnde cil, pirtûk û pêlîstokên xwe, li erdê nehiştin.



## Wateya Peyvan

**Xemsar:** Sersar
**Bas:** Otobus
**Seyrangeh:** cihê ger û geştê
**Gevizandin:** Xwe di nava axê de gindirandin û qirêjkirin

## Em Têbigihin

1-Çi tişt ji zarok bêzar bûn?
2-Tişt û miştên wî bi çi çûne gerê?
3-Qirêjî û belavbûna tiştan, bandoreke çawa li zarokî kir?

## Rêziman

1- di ziman de, Ji beşa herî biçûk a ku wateyekê radigihîne re ***peyv** tê gotin.*

2-Di her hevokeke li jêr de çend peyv hene?

- ***Zarokekî xemsar hebû.***
- ***Xwezî min ew rakiribûna?***
- ***Zarok ji dibistanê hat.***

3- Bi her peyveke li jêr, hevokekê çêkin?
*roj, gog, cil*

## HÎNDARÎ

- ❖ Mijarê destpêkê bêdeng, piştre jî bideng bixwînin.
- ❖ Di dema xwendinê de aram bin û rast rûnin.
- ❖ Dema ku hûn dipeyivin hay ji van xalan hebin.

- ***Destpêkê baş bihizirin, paşê biaxivin.***
- ***Nêrînên xwe bi rêk û pêk bidin têgihandin.***
- ***Peyvan rast bêjin.***
- ***Hevokên kurt saz bikin.***
- ***Bi dengekî asayî bipeyivin.***



MIJARA SERBEST

## AY LÊ GULÊ



Ay lê gulê gula minê
Şirîna li ber dilê minê
Gulê nadim malê dinê
Wel ser gulê têm kuştinê

Gulê kesk û sor û zer e
Nîşana alê li ser e
Êdî reng spî gewher e
Şirîn û peymana min ê

Rengê teyî pir delalî
Bilbil li ser te dinalî
Te nebînim di vî halî
Armanc û kesera minê

Gotin: Umerê Le'ilê
Stran: Mihemed Şêxo

# MORIYA BIÇÛK

Moriya Biçûk sibê zû şiyar dibe. Dibîne ku hemû xwîşk û birayên wê çûne. Ji xewê rabû û bêhnek stend. Rabû, çû dest û rûyê xwe şûştin.

Êdî ji bo destpêkirina jiyana xwe ya rojane amade bû. Wê rojê dibistan tunebû.

Ji ber vê yekê, di morîstanê de bi tenê mabû. Piştî ku ji morîstanê derket, rastî moriyên diçin kar, hat. Demekê wê li çûn û hatina moriyan temaşe kir. Piştre ket ser rê.

Pêşî berê xwe da gulistana ku moriyên biçûk lê dilîstin. Li wir bi xwîşk û birayên xwe re lîst. Gelek şad bûn.

Piştre dest bi temaşekirina moriyên ku dixebitin kir. Di wê demê de moriyeke mezin bi awayekî devliken jê pirsî:

-Tu jî dixwazî bixebitî?

Moriya biçûk dikeve xiroşê.

-Belê.

Moriya mezin:

-Jixwe çûna dibistanê jî karekî girîng e. Lê dema dibistan ket betlanê, tu jî dikarî li gel me bixebitî.



Moriya biçûk:

-Ez dixwazim li ser rûyê erdê bixebitim.

Moriya mezin:

-Baş e. Her morî li gorî hêza xwe kar dike. Di jiyana moriyan de hevkarî heye.

Moriya biçûk:

-Ez tê gihîştim.

Moriya mezin:

-Dema tu mezin bibî, tu yê baştir têbigihî.

## Wateya Peyvan

**Morîstan:** Kunmêrî, cih û warê moriyan
**Hevkar:** Alîkar

## Em Têbigihin

1- Bûyera di mijarê de, li kû derê qewimiye?
2- Moriya biçûk beriya ku ji malê derkeve, çi kir?
3- Moriyên biçûk di gulistanê de çi dikirin?
4- We, ji vê çîrokê çi fêm kir?

## Rêziman

*Ji her sererêzekê re **bend** tê gotin.*

## HÎNDARÎ

-Parvekirina karê malbata xwe diyar bikin. Bi çend hevokan binivîsin.

-Di mijarê de ji çêlika moriyê re gotiye moriya biçûk.

-Navên çêlikên tebayên jêr hîn bibin û binivîsin?

Mehîn, mih, bizin, çêlek, mirîşk, hirç, ker

## JIYAN



Min hezim le jiyane
Jiyan bew heze ciwane
Jiyan lay min xwêndine
Yariye pişûdane
Xebatêkî bê wêne
Encamekey wiçane
Min ew kesem xoşdewê
Bo xelkî bê ziyane
Destî mandûm xoş dewê
Xerîkî binyad nane
Karî be kelkim dewê
Nek karî fêkderane
Xwaye her awedan bê
Em xakey Kurdistane

***Rizgar Rastî***

## Wateya Peyvan

**Bew:** Bi wî
**La:** Alî
**Pişûdan:** Bêhnvekirin
**Xoşdewê:** Jê hez dikim
**Binyadnan:** Bingeh danîn
**Têkderane:** Xerabkar
**Yarî:** Lîstin
**Rawestan:** Sekinîn
**Mandû:** Westan
**Kelk:** Sûd, mifa
**Xwaye:** Ey Xwedê

## Wateya Helbestê bi Kurmanciya Jorîn

Min hezim le jiyane
*Ez ji jiyanê hez dikim*
Jiyan bew heze ciwane
*Jiyan bi wê hezkirinê xweşik e*
Yariye pişûdane
*Lîstik e û bêhnvedan e*
Encamekey wiçane
*Encama wê rawestan e*
Min ew kesem xoş dewê
*Ez ew kes im jê hez dikim*
Bo xelkî bê ziyane
*Ji bo xelkê bê zerer e*
Destî mandûm xoş dewê
*Destê westiyayî min xweş divê*
Karî be kelkim dewê
*Min karên bi sûd divê*
Nek karî fêkderane
*Ne karê sextekaran*
Xwaye her awedan bê
*Xwedayo her ava be*
Em xakey Kurdistan
*Ev axa Kurdistanê*

# EZ PIRTÛK IM



Ez pirtûk im. Bi wêneyên rengîn dagirtî me. Her rûpeleke min bi agahî û zanistên cuda xemilandî ye û çîrokên pir xweş jî di nav de hene. Her sibeh dema ku ez ji xewê radibim, bi dilkovanî radiwestim: "Dê kî min bixwîne û zanînê ji min bigire." Ji bo min, mayîna di nava refikên toz û gemarê yên pirtûkxaneyê de pir zor e...

-Gelo hûn dizanin, yên ku min bixwînin çi sûdê digirin? Ka guhdarî min bikin da ku ji we re hinek sûdên xwendinê bêjim:

-Agahiyên di derbarê çand, dîrok, wêje, xaknîgarî, zanist û hwd. de fêr dibî.

-Heger hûn bixwazin civak û gelên din binasin, hûn ê bi xwendina min bigihîjin daxwaza xwe. Ji ber ku ez dost û hevalê we yê herî nêzîk û dilsoz im.

## Wateya Peyvan

**Dilkovan:** Dilbixem
**Xaknîgarî:** erdnîgarî
**Dilsoz:** Wefadar

## Em Têbigihin

1- kî agahiyên di mijarê de radigihîne?
2- Pirtûk her sibeh bi dilkovanî li benda çi dimîne?
3- Gelo ji bilî pirtûkên dibistanê, tu pirtûkan dixwînî? Te çi sûd ji xwendina wan wergirtiye?

## Rêziman

Sergotara vê mijarê ji çend peyvan pêk hatiye?
Ew bi tîpên mezin, an yên biçûk hatiye nivîsîn?
Di mijarê de çend bend hene?
*Ji sererêzekê heya sererêzeke din re **bend** tê gotin.*
Her destpêkirina bendekê bi tîpa mezin tê nivîsîn.
Ji bo hejmara bendan bê dîtin sererêzan bihejmêrin.

## HÎNDARÎ

Dema hûn dixwînin, van tiştan li ber çavan bigirin:
-Bi goşê pel ê milê rastê bigirin û biqulibînin.
-Pelan bi tiliyên şil nequlibînin û nequrmiçînin.

# PIRTÛK



Ez pirtûkek bê deng im
Pir zana û çeleng im
Li fêrgehan têm xwendin
Tijî zanîn û pend im

Pir hezkiriyên min hene
Mîna xanî û feqe ne
Bi şev û roj têm xwendin
Tim dildarên min hene

Her kesê min dixwîne
Zanist sincan hiltîne
Tev bi min dibin hewce
Raman riyan dixemilîne

Îro va hatî şoreş
Bixwîne van rûpelên geş
Zana jîr bibe kurê kurd
Bi bîr bîne şevên reş

## Wateyên Peyvan

**Çeleng:** Bedew, xweşik, spehî
**Pend:** Şîret, gotinên mezinan, gotinên pêşiyan
**Sinc:** Exlaq, rewişt

## Em Têbigihin

1- Di malika yekem de kîjan pesin tên dayîn? Şîrove bikin.
2- Her kesê ku pirtûkê dixwîne, çi digire?
3- Di malika çarem de helbestvan çi ji kurdan xwestiye?

## HÎNDARÎ

1- Li ser helbestê bixebitin, heya hûn jî weke mamoste xweş bixwînin. Piştre helbestê bi awayekî bi wate û dengekî bilind bixwînin.

2- Ji bo pîrozkirina Roja Mamosteyan, ji mamosteyên xwe re nameyeke pîrozbahiyê binivîsin.

## MIJARA SERBEST

### PÊKENOK

Dema ku Zîlan ji dibistanê zivirî, dayîka wê di pêjgehê de bû. Bi lez û bez çû cem dayîka xwe. Dayîka Zîlanê rewşa wê asayî nedît, lê tênegiha ka çi hatiye serê wê û got:

- Keça min te xêr e! Tu ew qas behitî yî?

Zîlan:

- Îro! Dayê îro dema ku em ji dibistanê dizivirîn, yek ji trimpêlê ket. Her kes bi wê keniya; lê, ez nekeniyam.

- Dayîk:

- Bijî keça min! Bi kesên ku tiştên wiha tên serê wan, kenîn şerm e. Gelo ya ji tirimpêlê ketî kî bû?

Zîlan:

- Ez bûm dayê!



**NAVÊN LI JÊR DI XAÇEPIRSÊ DE DIYAR BIKIN**


kîso

şêr

kêvroşk

mêş


sivorî



| | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|
| K | Î | S | O | W | İ | G | M |
| Ê | E | İ | H | E | D | E | Ê |
| V | O | V | A | N | Ê | R | Ş |
| R | A | O | Î | R | D | A | A |
| O | P | R | H | B | L | B | R |
| Ş | Ê | Î | Ê | J | C | Ê | E |
| K | R | T | Z | R | O | T | T |
| Ş | Ê | R | O | A | Y | Û | N |
| R | R | A | M | B | N | N | N |

## TEST 1

1-Giroverên li jêr  bi tîpên dengdêr dagirin.




2- Peyvên di stûna (A), bigihînin wateya wan a di stûna (B) de.

| A | B |
|---|---|
| Perwerde | Xebatkarê dozê |
| Têkoşer | Fêrdarî |
| Xemsar | Lîstin |
| Yarî | Sersar |

3- Bersiva rast hilbijêrin:

* **Ji beşa ziman a herî biçûk û bi wate re çi tê gotin?**

a) nav    b) peyv    c) tîp

* **Nivîskarê helbesta "Ay lê gulê" kî ye?**

a) Umerê Le'ilê    b) M. Şêxo    c) Aram Tîkran

* **"Xwendekar ronahiya pêşerojê ne "** Li dawiya vê hevokê, kîjan hêma tê bikaranîn?

a) xalbêhnok    b) sêxal    c) xal

# BEŞA 2

## TEMAŞEKIRINA TELEVÎZYONÊ

Televîzyon amûreke ragihandin û agahiyê ye. Di televîzyonê de gelek rengên bernameyan tên weşandin, weke nûçe, werzîş, mûzîk, fîlm û hwd. Ji bilî van, bernameyên taybet ên ji bo zarokan jî hene ku zarok dikarin sûdê jê bigirin, weke: fîlmên karton û bernameyên perwerdeyê yên zarokan ku fêrî danûstendin û kiryarên baş dikin.



Di televîzyonê de ji bilî bernameyên erênî û baş, yên xerab ku bandoreke neyînî li pêşeroja zarokan dikin jî hene. Ji ber vê yekê, nabe zarok temaşeyî fîlmên tirs, şer û kuştin tê de heyî bikin da ku ziyanê li derûniya wan neke.

Ji ber vê yekê, pêwîst e em zarok ji xwe re bernameyên sûdwer hilbijêrin.

## Wateya Peyvan

**Sûd: Fayde**
**Bandor: Tesîr**
**Ragihandin: Belavkirina agahiyan**
**Agahî: Haydarî, nûçe**
**Weşan: Belavkirin**

## Em Têbigihin

1-Hûn temaşeyî kîjan bernameyan dikin?
2-Çi bandora bernameyên neyînî li ser temaşevanan heye?

## Destûrên Ziman

Di hevoka "*Banî heval**an** dikim*" de peyva "*heval**an***" navekî pirjimar e.

Dema em li ser "*heval*" qertafa"***an***"ê zêde dikin, navê yekjimar dibe pirjimar.

Navên li jêr ên yekjimar, bikin pirjimar.

Zarok, mal, ciwan, dibistan

## HÎNDARÎ

1- Divê hûn kengî li televîzyonê temaşe bikin û kengî nekin? Şîrove bikin.

Dema hûn bersiva pirsa li jor didin, pêwîst e hûn ji van xalan haydar bin:

-Tiştên ku hûn dixwazin temaşe bikin, destpêkê baş bihizirin û piştre hilbijêrin.

-Di rojê de, ji du demjimêran zêdetir temaşekirina televîzyonê bandoreke neyînî li çav û derûniya mirov dike.

-Nerînên dê, bav û mamosteyê xwe li ber çavan bigirin.

2- Pêwîst e di temaşekirinê de herî kêm em sê metreyan dûrî televîzyonê bin.

# HEVALTÎ ÇI QAS XWEŞ E

Azêd di refa sêyem de dixwend. Rojekê Azêd li bexçeyê dibistanê dilîst. Ji nişka ve zarokek derket pêşberî wî û her du li hev ketin. Azad li erdê ket û serê wî şkest. Serbest zû rahişt destê wî, destmala xwe ji berîka xwe derxist, danî ser birîna wî û ew bir odeya mamosteyan. Li wir mamosteyan birîna wî derman kir. Piştre Azad çû refa xwe û bi rêzdarî spasiya hevalê xwe Serbest kir.

Ji wê rojê û şûn de Azad êdî bêhtir ji Serbest hez kir û wî jî her tim bi dilsozane alîkariya hevalên xwe dikir. Êdî ji wê bûyerê û pê de Azad bû xwendekarekî nimûne di nava hevalên xwe de. Ji ber vê rewşê, êdî ne tenê xwendekaran mamostayan jî, ji ber van kiryarên hevpar ji Azêd hez dikir.



## MIJARA SERBEST

### EV E DINYA



Ev e dinya pir mezin e
Têra me hemya heye
Çima çavê we bar nabe
Qey tenê dinya weye
Em jî kurd in wek însanan
Mafê me jî lê heye



Ji nav baxê gula gul im
Her gulek bînek heye
Tev mirov in tev însan in
Her gelî rengek heye
Des bidin destê hev du de
Kes ji kesî ne zêde ye
Mil bidin milê hev du de
Salên xweş pêşya me ye



Gazî dikim li dinyayê
Hûn dizanin em kî ne
Xwediyê dîroka kevnar in
Zerdeştî û Medî ne
Em rêberê mileta bûn
Çima navê me nîne

## RÛMETÊN ME

Dema ku Hêlîn ji dibistanê hat, çavên xwe li dayîka xwe gerandin. Dayîka wê li odeya xwe ya razanê rûniştibû û di destê wê de wêneyê xalê wê hebû. Dengê dayîka wê dihat û digot:

- Serê min bi te bilind e.

Vê gotinê bala Hêlînê kişand, lê Hêlînê di çavên dayîka xwe de keser didît. Gazî xwîşk û birayê xwe kir û li derdora dayîka xwe rûniştin. Hêlînê ji dayîka xwe re got:

-Dayê, min ji te fam kir ku şehîd mirovên gelekî binirx in.

Dayîka wê, li nav çavên wê nêrî destê xwe di ser pora wê re anî û lê vegerand :

- Keça min, Mirovê ku tiştê xwe yê herî buha fedayî welat kiribin, ew ê her wiha pir binirx û pîroz bin.

Azêd berê xwe da xwîşka xwe û jê re got:

-Erê Hêlîn, xwîşkê, şehîd mirovên pir hêja ne. Kurdan di têkoşîna xwe ya azadiyê de pir şehîd dane. Van gotinan, bandor li ser Şîlana ku heta wê çaxê bêdeng mabû kir û bêhtir nêzî dayika xwe bû û got :

-Dayê can, şehîdan em parastine û niha jî ew me diparêzin?

Dayê bi dilekî tije hêvî, bi aramî zarokên xwe nêzî xwe kirin, destê xwe bi sere wan ve anî û Şîlan maç kir got: Zarokên min ên delal, ez pir bi axaftinên we kêfxweş bûm. Xaka me pir mezin e, li ser her bostekî vê axê şehîdan xwîn rijandine. Li ber her kevirekî şer kirine û bi vî awayî ev xaka pîroz parastine. Ji ber wê,  divê her tim nav û bîranîna wan di nava dil û mejiyê we de be. Ji ber ku ew ronahiya jiyana me ne, ku ew nebin, tn wateya me tuneye.

## Wateya Peyvan

**Rûmet** : Nirx-giranbuha
**Pakrewan** : Şehîd
**Dîrok** : Mêjû, tarîx

## Em Têbigihin

1- Dayîk û Hêlînê li ser kîjan mijaran dipeyvîn?
2- Li gorî mijarê, pêwîst e em li hemberî nirxên şehîdan çawa tev bigerîn?

## Rêziman

1- Di hevokên jêr de dengên binê wan hatî xêzkirin, bi serê xwe wateyekê nadin. *Ji van dengan(û-ku-jî) re **gihanek** tê gotin.*
Rêzan **<u>û</u>** Gulê bi hev re diçin dibistanê.
Pêwîst e hûn baş guhdar bikin **<u>ku</u>** hûn têbigihin.
Ez gelek şa bûm ku em **<u>jî</u>** xwediyê van rûmetên herî mezin in.
2- Her yek ji peyvên li jêr di hevokekê de bi kar bînin.
*Berxwedan, şehîd, ked*

## HÎNDARÎ

1-Nivîsa ku we li jor xwendî, bi çar-pênc hevokan şîrove bikin?

## XEBATÊN NIVÎSÎNÊ

**Tîpên Mezin**

A- B-C-Ç-D-E-Ê-F-G-H-I-Î-J-K-L-M-N-O-P-Q-R-S-Ş-T-U-Û-V-W-X-Y-Z.

**Tîpên Biçûk**

a- b- c- ç- d- e- ê- f- g- h- i- î- j- k- l- m- n- o- p- q- r- s- ş- t- u- û- v- w- x- y- z.



# BÎSTANÊ BAVÊ GÊJO

Rojekê ji rojan bavê Gêjo nexweş bû, di nava nivînan de bû. Gazî Gêjo kir û got: Lawo Gêjo here cem bijîşk û zû gazî wî bike; bila nesekine û were. Gêjo got: Çimaaa!. Bavê wî got: Gêjo! ma tu rewşa min nabînî?. Tu dê herî û jê re bêjî: Bavê min nexweş û bêhal e. Di nava nivînan de ye. Zikê wî werimiye, bûye weke kundirekî. Pozê wî sor bûye, bûye weke bacanekê. Serê wî nepixiye, bûye weke zebeşekî. Te fêm kir?

Gêjo serê xwe hejand û bi lez û bez ket ser riya mala bijîşkî û di ber xwe de digot: zebeş, bacan kundir. Dema bijîşkî jê re derî vekir, got: Bijîşk, bijîşk! bavê min, bavê min! bûye weke bîstanekî.



## RÊZDARIYA JI MAMOSTE RE




Rojekê li Efrînê vekirina dibistanekê hebû. Rêveberiya dibistanê û mêvanên vexwendî, xwendekar û malbatên wan amade bûn. Ji ber ku dibistana xwe vedikirin, hemû di nava kêfxweşiyeke mezin de bûn. Yekem car, bi zimanê dayîkê wê dest bi perwerdeyê bikirana.

Dema ku pêşkêşvan ji bo axaftina vekirinê banî Hevseroka Meclîsa Gel a Efrînê kir, xwendekarek rabû û gulek pêşkêşî wê kir. Wê bi rûgeşî gul ji destê zarokê girt û zarok maç û hembêz kir û jê re got:
-Yên ku şayanê vê gulê mamoste ne, gula min, ne ez im. Gulê bide mamosteyan. lewre Mamostetî karekî pîroz e.

## Wateyên Peyvan

**Rêzdarî:** Hurmetdayîn
**Vexwendin:** gazîkirin, dawetkirin
**Şayan:** Hêja, stêle, layîq

## Em Têbigihin

1- Mamoste, xwendekar û malbatên wan ji bo çi kom bûbûn?
2- Kêfxweşiya wan kesên amade, ji bo çi bû?
3- Pêşkêşvan ji bo axaftinê, gazî kê kir?

## Rêziman

1- Çima navên li jêr taybet in?
"Dêrik, Efrîn, Kobanê, Qamişlo"
*Ji navên ku heyînekê bi tenê diyar dikin re* ***navên taybet*** *tê gotin.*
2- Tîpa destpêka navên taybet mezin tê nivîsîn.

## HÎNDARÎ

1- Destpêkê, mijarê ji mamosteyê xwe baş guhdar bikin; piştre hûn bixwînin.
2- Dema ku hevalên we mijar xwendin, baş guhdar bikin ka hevalên we mijarê rast dixwînin an na?
3-Ramana bingehîn a mijarê di lênûsa xwe de binivîsin. Paşê jî di refê de ji hevalên xwe re bixwînin.

## XEBATÊN NIVÎSÎNÊ

**Tîpên Mezin**

**A B C Ç D E Ê F G I Î J K L M N O P Q R S Ş T U Û V W X Y Z**

**Tîpên Biçûk**

**a b c ç d e ê f g h i î j k l m n o p q r s ş t u û v w x y z**

# EFRÎN

Piştî ku Lîlav û malbata xwe ji seyrana heftane ya Efrînê vegeriyan Dirbêsiyê, Lîlav gelekî kêfxweş bûbû. Ji ber vê yekê, hevalê wê Sîpan mereq kir û jê pirsî:

-Sedema vê kêfxweşiya te ya zêde, çi ye?

Lîlavê, berê xwe da Sîpanî û hinek din nêzî wî bû û got:

-Ji ber ku ez û malbata xwe çûbûn Efrînê û me demeke pir xweş li wir derbas kir.

Dema ku Lîlavê wiha got, Evînê pir mereq kir û ji Lîlavê xwest ku hinekî ji wan re behsa  Efrînê bike.

Lîlavê  jî pir ji dil temaşeyî wan kir û got:

-Efrîn bajarekî rengîn ê Rojava ye. Weke bûkekê ye, ku bi darên zeytûn, rûbar, kanî, deşt û baniyan hatiye xemilandin. Ji ber wê jî, avhewaya wê pir xweş û hênik e. Her wiha, li Efrînê gelek cihên dîrokî jî hene, weke; Kela Semanê, Kela Hûriyan û Eyndara ku cihên bi nav û deng û dîrokî ne. Di gel wan, Sûlava Meydankê û Basûta ku cihên pir xweş in û weke seyrangehan in jî hene.

Di vê navberê de, dema ku Lîlavê behsa erdnîgarî, çiya û baniyên Efrînê dikir, çavên wê dibiriqîn û  hezkirin ji rûyê wê dibariya. Ji ber vê yekê, Sîpan û Evîn pir bi gotinên wê bandor bûn û biryar dan ku sala were, seyrana xwe ya salane li Efrînê derbas bikin.





## Wateya Peyvan

**Avhewa**:Rewşa hewayê/şilî û zuhayî
**Sedem**: Sebeb
**Dîrok**: Tarîx-mêjû
**Sûlav**: Şelale
**Seyrangeh**: Cihê ger û geştê

## Em Têbigihin

1- Çima Lîlav gelek kêfxweş bû?
2- Efrîn bajarekî kîjan parçeyê Kurdistanê ye?
3- Sîpanî û Evînê çi biryar dan?

## Hîndarî

Hûn û hevalên xwe li ser taybetmendiyên Efrînê guftûgo bikin.
Li ser seyraneke xwe bi çend hevokan binivîse û ji hevalên xwe re ragihîne.

# PARASTINA XWEZAYÊ

Parastina xwezayê parastina jiyanê ye. Ji ber vê, divê em her tim xwezayê weke canê xwe biparêzin. Lewre heke em xwezayê qirêj bikin. wê ne tenê jiyana mirovan, her wiha jiyana hemû zindiyan bikeve metirsiyê. Bi vê yekê re roj bi roj wê nexweşî û mirin zêde bibin.

Rojekê em jî ji bo kêf û şadiyê bi malbateke nas re, bi keştiyê çûbûn geşta Gola Wanê. Di wê navberê de dostê min ji berîka xwe pakêtek çeqûlat derxist. Piştî ku çeqûlat dan zarokan, kaxeza wê qurmiçand û avêt golê. Di wê navberê de zarokekê da ber qîran :

-Aaa! Hûn ê Golê qirêj bikin! Binêrin, li pêşberî we selika gemarê heye. gemara xwe neavêjin golê, bavêjin selikê.

Rojek din ez bi hevalekî xwe re ji aliyê bajarê Xelatê ve daketim Golê. Lê çavên we nebînin! Xweşikiya gola Wana min î rengîn di nava qirêj û gemarê de winda bûbû. Peravên golê ji ber gemarê nedihatin dîtin. Ji ber wê yekê, ez pir hêrs bûm û di vê hêrsê de min banî berpirsyarî kir û gotê:

- Ji bo çi ev der gemar in, çima hûn van deran paqij nakin?

Berpirsî bersivek wisa da:

-Hey camêr, em her tim van deran paqij dikin, lê ez çi ji van kesên bêhiş û bê berpirsyarî tevger dikin, bikim. Ew ne xwe dinasin, ne jî hawîrdora xwe. Ew nizanin ka gemarkirina hawîrdorê çi qas ziyanê dide xweza û jiyana mirovan.

Ji bo gol paqij bimîne; tê xwestin ku em ji her goşeyeke welatê xwe, weke mala xwe hez bikin. Di rastiyê de divê welat weke mala mezin bê dîtin. Wê demê welat dê maleke paqij û malbateke bi serûber be.



**Gemar xwezayê dikuje**



**Parastina xwezayê parastina jiyanê ye**

## Wateya Peyvan

**Xelat:** Navçeyeke girêdayî bajarê Bidlîsê ye.
**metirsî:** xeterî, tehlûke
**Perav:** qirax

## Em Têbigihin

1- Çima zarok qêriya?
2-Zarokê xwest, ew mirov çi bike?
3-Çima li Xelatê gol paqij nedikirin?

## Rêziman

1-Ji peyvên ku li jêr hatine nivîsîn, kîjan rast in?
Xalat - Xelat
Welat - Walet

2-Ji navên ku gelek tiştên weke hev diyar dikin re , **navên giştî** an **hevenav** tê gotin.

**Mînak:** dema ku peyva 'gol' tê gotin, gelek gol tên bîra mirov.

**gol** **mirov** **zarok** **keştî**

## HÎNDARÎ

1- Ji bo ku xwendina we xweş bibe. Di dema xwendinê de li cihê bêhnok(,), xal(.) û nîşana pirsê(?) li gorî pêdiviyê rawestin.

2- hevoka li jêr şîrove bikin. Girêdana wê ya bi mijarê re diyar bikin.

*"Eger her kes derdora mala xwe paqij bigire, tevahiya welatê me wê paqij bimîne."*

# PERPERÎK



*Perperîka evîndar*
*Xalên perên te jîndar*
*Li ser gulan digerî*
*Bi te dibim hêvîdar*

*Tu kes nebêjin kulî*
*Ew ê lingê wî stirî*
*Ev guleke difire*
*Xemla derdora min î*

Penaber

***Mijara bi navê perperîk, bi tîpên mezin û biçûk bi xemil û xêz di lênûsa xwe de binivîsin.***

# TEST 2

**1-** ji hevokên li jêr ya rast bi tîpa (R), ya şaş jî bi tîpa (Ş) nîşan bikin.

A) **Navên taybet:** Ew nav in ku ji bo heyînekê bi tenê tên bikaranîn. ( )

B) **Çiya:** navekî giştî ye ( )

C) **Eyndara:** cihekî dîrokî ( )

**2- Bersiva rast a pirsên li jêr hilbijêre.**

**1- Di kîjan hevoka li jêr de navê taybet heye?**

a) Bizin diçêrin. b) Firoke difirin. c) Kerkûk bajarekî dîrokî ye.

**2-Ji rêzepeyvên li jêr kîjan ne hevok e?**

a) Rojekê heval hatin. b) Me sêv xwarin. c) Sibe hûn.

**3- Di peyva destpêka vê hevoka li jêr de çend tîpên dengdêr hene?**

"Wateya berxwedan û kedê çi ye?"

a) du b) çar c) sê

**4- Çima şehîd mirovên binirx in?**

a) Ji ber ku ne ji civaka me.

b) Ji ber ku ji bo welat canê xwe feda kirine.

c) Ji ber ku şer nekirine.

**5- Çima pêwîst e em xwezayê biparêzin?**

a) Ji bo parastina jiyanê

c) Ji bo germahiya derdorê

b) Ji bo gemarkirina derdorê.

# BEŞA 3

## GURÊ ÇAVBIRÇÎ

Hebû tunebû, di demên pir kevin de, gurekî birçî û dirantûj hebû, roviyekî fêlbaz digire û jê re dibêje:

- Zû ji min re hinek xwarin bibîne, yan ez ê te bixwim.

Rovî jê re got: Nêzîkî me, mala cotkarekî heye. wî conegayek kuştiye û goştê wî li ser xênî veşartiye. Ger tu bixwazî, em dikarin bi hev re biçin bixwin.

Gur:

- Bila, lê hem di çûyîna malê de, hem jî piştî me goşt xwar, di revînê de tu yê alîkariya min bikî.

Her du bi hev re ber bi mala cotkarî ve bi rê ketin û bêdeng çûn ser xênî. Dema ku gur goştê zêde dibîne, pir kêfa gur tê. Ji kêfan nizane çi bike. Rovî jî hem goşt dixwe, hem jî bi çavên xwe kulekê dipîve, da ku bi hêsanî bikare tê re bireve.

Gurî jê pirsî:

- Çima tu bi dilê xwe naxwî?

Rovî:

- Ez lê dinêrim ka kes tê yan Na. Ez ji bo te jî pêşniyar dikim, zêde nexwe.



Gelek neçû, cotkarî dengek ji ser xênî bihîst û bezî. Dema ku rovî dengê lingê cotkarî bihîst, di kuleka hatî re zû derket û çû. Gur jî xwest li pey wî biçe, lê ji ber ku zêde goşt xwaribû, zikê wî werimîbû û di kulekê de asê ma.

## Wateya Peyvan

**Çavbirçî:** Têrnexwarî
**Kulek:** Pace, şibake

## Em Têbigihin

1- Gur û Rovî ji bo zikê xwe têr bikin, çûn kû derê?
2- Bi rêzê ve çi bi serê gur û rovî hat?
3- Taybetmendiyên gur û roviyê ku di vê çîrokê de cih digirin, çi ne?

## Rêziman

Hevoka li jêr di lênûsa xwe de binivîsin.

*"nêzîkî me, mala cotkarekî heye."*

Di vê hevokê de peyva cotkar, peyveke pêkhatî ye, ji peyva **"cot"** û paşgira **"kar"** pêk hatiye.

Çi têkilî di navbera peyvên **"cot"** û **"cotkar"** de heye? Di refê de şîrove bikin.

2-*"**Çima tu bi dilê xwe naxwî?**"* Çi nîşane li dawiya vê hevokê hatiye danîn?

**Pirsnîşan (?):** li dawiya hevokên pirsyariyê tê danîn.

## HÎNDARÎ

1- Dema hûn mijarê dixwînin, peyvên ku hûn wateya wan nizanin, diyar bikin. Ji bo têgihiştina wan peyvan, alîkariyê ji mamoste û hevalên xwe bixwazin. Her wiha, sûdê ji Ferhenga Kurdî jî bigirin û têbigihin.

2- Bêyî ku hûn rêza bûyerên çîroka li jor xerab bikin, çîrokê vebêjin. Piştre, bi çend hevokan li lênûsa xwe binivîsin. Dema hûn kurtiya çîrokê dinivîsin, rêgezên nivîsînê, di cih de bi kar bînin. Ramana bingehîn a we nivîsî, nîşanî mamosteyê/a xwe bikin.

***"Mirov dikare zikbirçiyan têr bike, lê mirov nikare çavbirçiyan têr bike"***

*(Gotina Pêşiyan)*

# XALÊ MIN Ê COTKAR

Wê rojê, piştî ez ji dibistanê hatim, destpêkê min cilên xwe yên dibistanê guhertin, dest û rûyên xwe baş bi sabûnê şûştin û paşê dayîka min gazî min kir "were firavînê bixwe canê min" bi gotina diya xwe re, ez ber bi pêjgehê ve çûm. Ji ber ku me timî xwarin li pêjgehê dixwar. Dema ku min pel li ser sifrê dîtin, pir kêfa min hat. Nizanim, pir birçî bûbûm an jî dayîka min pir xweş çêkiribûn. Piştî ku min têr xwar, min destxweşî li dayîka xwe kir. wê bi gotina "noşîcan be, canê te pê neêşe kurê min" bersiva min da.

Xalê min cotkar bû, ew mirovekî pir hêja û têgihiştî bû. Jixwe ji wî pê ve xalên min nebûn. Ji ber vê yekê, dayîka min ew tu caran ji xwarinên mala me bêpar nedihişt. Bi taybet, dema ku xwarineke xwemalî (seredew, kutilk, şamborek, keledoş, pel, mehîr, serûpê...) çêkira, xalê min li kû ba diviyabû jê re bişanda. Ji ber ku kes li malê tunebû, piştî ku diya min navnîşana zeviya cot ji min re got, min beroş rakir û ez bi lez gihiştim cem xalê xwe. Di wê navberê de wî hîna bi du gayan cot dikir û di nava xwêdanê de mabû. Piştî ku min jê re got; "Qewet be xalo", bi destê xwe yê çepê xwêdana eniya xwe paqij kir û bi gotina; "Tu sax bî xwarzîkê min, ka were te ji bo xalê xwe çi aniye" bersiva min da.

Piştî ku xwarina xwe xwar, min jê pirsî: Xalo, tu yê çi biçînî?



Ji rûyê wî diyar bû ku bi pirsa min kêfxweş bûbû, destê xwe bi serê min ve anî, kêmekî keniya û bi gotineke pêşiyan bersiva min da; "Dema şîn bû, tu yê bibînî." Paşê ez xistim himêza xwe û wiha ji min re got: "Xwarzîkê min, bila li bîra te be; ne tenê gundî, jiyana hemû bajar, welat û mirovan li ser çandinî û sewalvaniyê ye. Ger di welatekî de cotkarî û sewalvanî ne pêşketî be tu caran ew walat xwe li ser piyan nagire û wê her dem li ber mineta welatên din be. Ji ber vê yekê, dema ku te xwendina xwe qedand û bûyî karbidestek, divê tu ne tenê girîngî, her wiha rêzdariyeke pir mezin jî bidî keda cotkar û sewalvanan, baş e, xwarzîkê min ê delal?!..."

Ez bi van gotinên xalê xwe pir kêfxweş bûm. Min wê demê fêm kir ku xalê min û cotkarên din ne tenê cotkar in; kedkarên gel û welatê xwe ne jî.

# XEBAT Û KAR

Bê xebat û kar û bizav
Bê zanîn û rijîm û rav
Navê xudanê heq û nav
Navê xudanê heq û nav

Eger bimîne sist û xav
Ev taristan nabe hetav
Peyda dibe jana zirav
Peyda dibe jana zirav

Pêşkevin xortno gav bi gav
Bixebite ji dil û hinav
Şareza be û hebe sed çav
Şareza be û hebe sed çav *M. Şêxo*



## PENDÊN PÊŞIYAN

***Gotinên li jêr bixwînin.***

Mala pîrê, xweştir e ji ya mîrê.

Rih dibe bost, dijmin nabe dost.

Nanê nekera li tu dera tune ye

Kanî te av jê vexwar, gemar neke

Av çi qasî di golê de bimîne, genî dibe.



# NAME JI BO DAPÎRÊ

Dapîra min a hêja:

Ez dizanim, ji bo nivîsîna nameyê dereng mam. Min îro jimart. Ev sê meh in, em ji hev dûr ketine. Min bibexşîne.

Em hemû li vê derê baş in. Waneyên min jî baş diborin. Birayê min jî fêrî xwendin û nivîsînê dibe. Ji bo vê bi şev û roj dixebite.

Xweşiyên bêhnvedana ku min li gel we derbas kiribû, ji bîr nakim. Dehla ku me bi hev re av dida, fêkiyên me ji çiqên daran kom dikirin, hîn jî li pêş çavên min in.

Hîn jî dema Çavreş ji koxa xwe dûr dimîne, dike orîn?

Tama nîvişk û toya ku we çêdikir, tu car ji devê min naçe. Caniya me Reşbelek, careke din teriya xwe radike û dibeze?

Dapîra min, ez li benda dîtina we me. Ji bo hatina li gel we bêhedar im. Min gelek bêriya we, bapîrê xwe û gund kiriye.

Ez ji dayîk, bav û birayên xwe re silavên xwe yên ji dil û can dişînim. Ji bo we rojên xweş dixwazim.

Silav û hezkirin.

(şanenav)
***Dilar HESRET***
Navnîşan: Hesekê
14-02-2002





## Wateya Peyvan

**Canî:** Mehîna biçûk
**Bexşandin:** Lêborîn
**Şanenav:** Îmze, wajo

## Em Têbigihin

1-Dilar, ji bo kê name dinivîsî?
2-Ji rojên ku Dilarê li gund borandî, çi di bîra wê de mane ?
3-Dilarê, di her du bendên dawî yên nameya xwe de çi gotiye?
4-Dîrok û navnîşan, li kû dera nameyê hatine nivîsîn?

## Rêziman

1-Navê çêlek û caniya di nameya Dilarê de derbas dibe çi cureya navan e?

Tîpên despêka van navan di nava hevokê de mezin hatine nivîsîn.

Weke ku di nameyê de tê dîtin, navên taybet li lawiran jî tên kirin. Hûn jî çend navên taybet ên ku li lawiran hatine kirin binivîsin.

2- Her peyveke li jêr, di nava hevokekê de bi kar bînin.

nîvişk, dapîr, bapîr

# HÎNDARÎ

1- Nameyekê ji xizmek an jî ji lêzimekî xwe re binivîsin.
Dema hûn nameyê dinivîsin van xalan ji bîr nekin.
Dîroka wê, şanenav û navnîşana xwe li cihê guncaw binivîsin.
Nameya xwe li ser peleke bêxêzik û xweşik binivîsin.
Nameya xwe bi silav û hêviyên geş û xweş, bi dawî bikin.

2- Li ser namedanka li jêr, çi agahî cih digirin vebêjin.

3- Nameya xwe, weke mînaka nameya li jor binivîsin, bixin namedankê û bişînin.



## BERF NABÊJE EZ TÊM

Heta ku berf nebare û her derê di nava sar û sermayê de neqerisîne, gelek ji me amadekariyên xwe nakin û paşê jî gilî û gazinan ji barîna berfê dikin. Weke destebiratiya **hêştir** û **berfê**.

Wekî ku tê gotin: dibêjin di demên berê de hêştir û berf bûbûn destebirakên hev. Rojekê hêştir ji berfê re dibêje:

-destebirakê, ji kerema xwe re, beriya hatina xwe min agahdar bike, da ku ez tedbîra xwe bigirim.

Berf dibêje:



- Wey ser seran û ser çavan destebiraka hêştir. Ez ê te agahdar bikim. Rojekê berf li ser serê Çiyayê Bagokê bariya. Bi vê yekê, hemû lawir û sewal bi keft û leftekê ketin nava amadekarî û tedbîrên zivistanê. Lê, ne xema hêştirê bû û di nava mêrgekê de ji xwe re diçêriya û li bendê bû ku berf jê re bêje "va ye ez têm!". Ji ber wê yekê jî, ne amadekarî û ne jî tedbîrên xwe girtin. Di demeke kin de berfê ji serê çiyê xwe hêdî hêdî bi ser gund de berda. Her der bi spîkirasê berfê xemilî.

Hêştir, hêrs bû û bi dengekî bilind bang kir:

- Ka destebiratiya te, Ka te dê ez agahdar bikirama?!

  Berfê serê xwe hilanî û bi dengekî nazik bersiva Hêştirê da û got:

- Qey tu kor bûyî destebirakê? Dema ku ez daketim serê çiyê, min dar û ber tev spî kirin, ma qey ew ne agahî bû? Hîn çawa ji te re bêjim va ez hatim?!

## Wateya Peyvan

**Çiyayê Bagokê:** Çiyayekî li Bakurê Kurdistanê ye
**Destebira:** dost, heval

## Em Têbigihin

1- Di barîna berfê de çi guhertin çêbû?
2- Çima hêştirê tedbîrên xwe negirtin?

## Rêziman

1- Di dawiya hevokên li jêr de kîjan nîşaneyên xalbendiyê hatine bikaranîn?
Van hevokan di lênûsa xwe de binivîsin.
**Befir barî, befir barî!**

**Çi bûye li van deveran?**

## HÎNDARÎ

**1-Dema ku mamosteyê/a we helbestê dixwîne li van xalan şiyar bin.**
- Li dawiya rêzikê li kîjan hêmanê çi qas radiweste?
- Her rêzikekê bi rengedengekî çawa dixwîne?
- Hevalê xwe yê herî xweş helbestê dixwîne, mînak bigirin.

# HEŞTÊ ADARÊ

**Hêlîn:** Îro 8'ê Adarê ye û rojeke pîroz e. Em jî bi vê rojê gelek dilşad in.

**Sîdar:** Ji bo çi pîroz e, çi di vê rojê de qewimiye heya ku pîroz e?

**Hêlîn:** ma te nebihîstiye?

**Sîdar:** Na, min nebihîstiye. Ger te bihîstibe ji min re jî bêje.

**Hêlîn:** Tu dizanî, di 8'ê Adara 1871'ê de, jinên kedkar ji bo bidestxistina mafên xwe serî hildan.

**Sîdar:** li kû li kû?!

**Hêlîn:** li Newyorka Emerîkayê xebatkarên kargeha Kotal.

**Sîdar:** vêca?

**Hêlîn:** vêcaaa, vêca! Karbidest û dewleta faşîst êrîşî wan kir. Gelek jinên kedkar jiyana xwe ji dest da.

**Sîdar:** hey wax! min nû zanî çima 8'ê adarê roja jinan e.

**Hêlîn:** li ser vê yekê di sala 1910'an de weke Roja Jinên Kedkar ên Cîhanê hate pejirandin û ji wê rojê û pê ve tê pîrozkirin.

**Sîdar:** Gelo ev roj ji bo me tê çi wateyê?

**Hêlîn:** Belê hevalê Sîdar! Têkoşîna me ya azadiyê didome. Aliyê wê yê herî girîng jî berdewamiya têkoşîna jinê ye.

**Sîdar:** Çawa?

**Hêlîn:** ma te nebihîstiye? Azadiya jinê, azadiya civakê ye. Lewre "Jin jiyan e." Jin Çavkaniya avakirin, afirandin û çêkirinê ye.



## Wateya Peyvan

**Dilşad:** Dilxweş, kêfxweş
**Kargeh:** Cihên ku tişt lê tên çêkirin.
**Karbidest:** rayedar, kesê ku kar di destê wî de ye
**Çavkanî:** Jêder

## Em Têbigihin

1- Hêlîn çi ji hevala xwe re rave dike?
2- Ji kengî ve 8'ê Adarê tê pîrozkirin?
3- Azadiya jinê, tê çi wateyê?
4- Jin çavkaniya çi ye?

## Rêziman

Dema ku qertafên "**ên, an**" tên ber peyvên yekjimar wateya pirjimariyê didin wan.

Mînak:

Jin - Jin**ên** welatparêz
Jin - Mafê jin**an**
Karker - Karker**ên** welatparêz
Karker - Mafê karker**an**

## HÎNDARÎ

1- Mijarê bê deng û bilez bixwînin.
2- Mijarê di refê de bi deng û rast bixwînin.
3- Dema hevalek we bi deng dixwîne, bi baldarî guhdarî bikin û bi tiştekî ve mijul nebin. Di cihê xwe de bi asayî û rast rûnin.

## TEST 3

**1-Bersiva rast bi tîpa (R) û ya şaş jî bi tîpa (Ş) nîşan bikin.**

a- Di gotina "jinên welatparêz" de, peyva jinên yekjimar e. ( )

b- Wateya peyva "**Bexşandin**": Lêborîn e. ( )

**2- Bersiva rast hilbijêrin.**

**a- Kîjan navê li jêr taybet e?**

1) Pênûs
2) Dibistan
3) Aram

**3- Kîjan hevoka li jêr rast hatiye nivîsîn?**

a) Cotkar kedkarê welat e.
b) Çû mal ew.
c) Xwe nekir amade ji şer re

**4- kîjan roj, Roja Jinên Kedkar ên Cîhanê ye?**

a) 21'ê Adarê
b) 8'ê Adarê
c) 1'ê Gulanê

# BEŞA 4

## ÇIMA NAKENE!

Qerdarê Behlûlî tê, qerê xwe ji Behlûlî dixwaze.

Behlûl:

-Bi Yezdan, niha diravên min tunene, lê ez ê di demeke nêzîk de bidim te.

Zilam xwe vedikişîne:

-Tu yê kengî û çawa bidî min?

Behlûl:

- va ye bihar tê, koçer wê di ber me re derbas bibin û biçin zozanan. dema derbas bûn wê hiriya pezê wan bi dar û deviyan ve bimîne.

- Êêê!...

- Hingî Xatûna min, dê wê hiriyê kom bike, birêse û bike rîs.

Ez ê jî wî rîsî bibim bazarê bifiroşim û diravên te bidim te.

Bû tîqetîqa zilam û ji qehra keniya.

Behlûl:

- Çima nakene! Diravên xwe di destê xwe de dîtin.



## Wateya Peyvan

**Ristin:** Ji hiriya mih û mûyên bizinan çêkirina ben.
**Qerdar:** Deyndar
**Dirav:** Pere

## Em Têbigihin

1- Zilêm, çi ji Behlûlî xwest?
2- Behlûlî, riyeke çawa ji qerdarê xwe re pêşniyar kir?
3- Qerdar, çima bi vê pêşniyarê kenî?

## Rêziman

Di çîrokê de, çima nîşaneya(!) baneşanê li dawiya peyv û hevoka li jêr hatiye bikaranîn.

- Êêê!...
- Çima nakene!

Li dawiya peyv û hevokên ku hestên bilind (kelecan, dilxweşî, tirs, xem, coş û xuroş) tê de hebin, nîşaneya baneşanê tê danîn.

## HÎNDARÎ

1- Bêyî ku hûn li pirtûkê binêrin, çîroka li jor, dido dido zindî bikin.
2- Lîstoka hûn dilîzin, bi liv û tevgeran dewlemend bikin.
3- Fêrî çîrokeke Behlûl bibin. Vê çîrokê, bi xwe binivîsin. Dema hûn dinivîsin, bila haya we ji nîşaneyên xalbendiyê hebe.
4- Çîrokê, pêşî bêdeng bixwînin.

## ZAROK Û LÎSTOK

Dema zarok li hev kom dibin û ji xwe re dilîzin, dilê wan ji kêf û şadiyan difûre. Lê kesên mezin di warê lîstinê de xwediyê nêrînên cuda ne. Dibêjin: "Hûn ê cil û bergên xwe bikin herî û gemar." Bi vê helwestê, ji lîstinê re astengiyan derdixin, lê lîstin ji bo tenduristiya zarokan pir baş e.

Belê, dema ku ez di dibistana seretayî de bûm, ez rojekê di navbera du waneyan de, ji refê derneketibûm. Ez li cihê xwe rûniştibûm, min pirtûkek dixwend. Li derve jî baraneke hûr dibariya. Hemû hevalên min ji xwe re dilîstin. Mamosteyeke me ji derve hat. Bi destê min girt, ez derxistim derve û got:

-Pêwîst e zarok, zarokatiya xwe bijî. Dema xwendinê xwendin, dema lîstinê lîstin.

Ev çend sal in, min ev gotin ji bîr nekiriye. Piştî ku ez mezin bûm, min rastiya vê gotinê fêm kir. Dostanî, hevaltî û hevkarî bi lîstokan tên destpêkirin. Bi vê boneyê, her roj di baxçeyê dibistanê de, min bi hevalên xwe re gog û lîstokên din dilîst.



## Wateya Peyvan

**Cil û berg:** kinc
**Gemar:** Qirêj
**Tenduristî:** sihet
**Helwest:** mewqif
**Bone:** Munasebet

## Em Têbigihin

1- Li gorî mijarê, çima yên mezin astengiyan derdixin, hûn tevlî dîtina wan dibin?
2- Lîstin, çima ji bo zarokan pêwîst e?
3- Xwendekarî kîjan gotina mamoste ji bîr nekiribû?
4- Tu ji kîjan lîstokê hez dikî?

## Rêziman

Hûn dizanin ku hinek peyv bi tena serê xwe tu wateyê nadin, lê hevokan sergihayî û temam dikin. Ji van peyvan re "daçek" tê gotin.

Daçekên bingehîn: ji, bi, li , di...de

Mînak:

Dilê wan ji kêf û şadiyan difûre.
Dostanî,hevkarî û hevaltî bi lîstokan dest pê dikin.
Ez li cihê xwe rûniştibûm.
Kesên mezin di warê lîstinê de xwediyê nêrînên cuda ne.

.

## HÎNDARÎ

**1)** Hûn jî cihên vala bi daçekên guncaw dagirin.
- Ez ...Qamişlo me.
- Em ....gogê dilîzin.
- Serdar.... kargehê kar dike.
- .... mala me .... gelek dar hene.

## XEBATÊN NIVÎSÎNÊ

Tîpên biçûk û mezin li jêr çawa hatine nivîsîn, lêkolîn bikin. Wan rast û bi şêweyekî xweşik li lênûsa xwe binivîsin.

**Tîpên Biçûk**

c f z g i r h x j û k a l î m ç n d t e b o s v p y q ş u w ê


**Tîpên Mezin**

K J C M O W B R Ê N F V H Y Î Z Û L Q P A S Ç G Ş T D E U X I

# NALÎNA KURDISTANÊ

Nalînek tê guhê min
Lê winda û nihan e
Agir berda dilê min
Tev bû pêt û dûxan e
Barek da ser milê min
Lê barekî giran e
Dabûn ser hev kulên min
Hemî derd û bela ne
Kurdistana delal im
Her kes tê min dixwazî
Ez pir şox û şepal im
Min deng daye bi nazî








Ev bûye bîst û du sal e
Li ser min cengebazî
Kurdo wer min bixwaze
Belê bi serfirazî

Nalînek tê guhê min
Lê winda û nihan e
Agir berda dilê min
Tev bû pêt û dûxan e
Barek da ser milê min
Lê barekî giran e
Dabûn ser hev kulên min
Hemî derd û bela ne
(...)



## Wateyên Peyvan

**nihan:** windayî, veşartî
**şox:** şad, xweş
**şepal:** bi wateya xweşikbûnê hatiye
**cengebazî:** şer û ceng, şerê bideng
**Biyanî:** Kesê nenas
**Têkoşîn:** Hewldan û xebat

## Em Têbigihin

1- Nalînek çawa tê guhê helbestvan?
2- Çima her kes Kurdistanê dixwaze?
3- Te ji vê helbestê çi sûd girt?

## XWENDEKAREKE JÎR

Ez xwendekareke jîr im.
Zana û bi hiş û bîr im

Hez dikim ji dibistanê.
Bo xizmeta Kurdistanê.

Dixwînim bi zimanê xwe.
Da ez nas bikim gelê xwe.

Armanc ne şer e, aştî ye.
Ji bo welat azadî ye.

Çek û pênûs hevalbend in.
Ew bi hev re dewlemend in.



## Wateya Peyvan

**Bi hiş û bîr:** Zana, bihiş
**Jîr:** Jêhatî
**Hevalbend:** Hevaltiya hev

## Em Têbigihin

1- Xwendekar, xwe çawa dide nasîn?
2- Çima xwendekar ji dibistanê hez dike?
3- Armanca xwendekar ji zanabûnê çi ye?
4- Ji bo azadiyê çi tê xwestin?

## HÎNDARÎ

1- ji bo cihê ku hûn diçinê binasin, divê hûn pirsên çawa bikin?
***-Ez çawa dikarim biçim nexweşxaneyê?***
***-Hûn dikarin vê navnîşanê bi min bidin nasîn?***
2- dema ku Kesek pirsên wiha ji we bike, bersivên rast bidin.

**Navê lehengên kurdan ên li jêr, di xaçepirsê de bibînin.**



Arîn

Gênco

Seydo

Serhed

Silava

| | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|
| A | Î | S | O | W | I | S | Z |
| R | E | E | H | E | D | I | Î |
| Î | O | M | A | N | S | L | I |
| N | A | S | Î | R | E | A | A |
| X | E | B | A | T | Y | V | N |
| Ş | Ê | R | Ê | J | D | A | E |
| N | G | Ê | N | C | O | T | T |
| E | Î | R | O | A | Y | û | N |
| V | I | S | E | R | H | E | D |

# DARA GÛZÊ

Dara gûzê, yek ji wan daran e ku ji deh heya sîh, sîh û pênc bilind û  belav dibe. di heman demê de yek ji darên herî temendirêj e.

Ev dar li berav û herêmên çiyayî û hênik çêdibe. Her dera ku lê şîn tê bi xemil û xêza xwe dixemilîne.  Her wiha, ji bilî vê jî ji dara gûzê gelek tiştên nav malê û amûrên weke: mêze, kursî, dolab û tembûr jî tên çêkirin.

Gûzên ku di demsala payîzê de digihêjin, di hemû demsalan de peyda dibin û bi taybetî di demsala zivistanê de tên xwarin, pir bi sûd in. Hin ji sûdên wê, ev in:

- Ji bo bikaranîna mejî, hizir û bîra mirovan pir baş e.
- Li himberî nexweşiyan ji bo bihêzkirina laşê mirovan xwarineke sûdmend e.




## Wateya peyvan

**Temendirêj:** Zêde jiyîn

## Em têbigihin

1- Dara gûzê, heta çend metreyan bilind dibe?
2- Gelo te dara gûzê dîtiye?
3- Di kîjan demsalê de gûz digihêjin?
4-Ji dara gûzê çi çêdibe?

## Hîndarî

Hûn kîjan darên fêkiyan dinasin?
Hûn jî dikarin sûdên darekê binivîsin?

## XEBATÊN NIVÎSÎNÊ

**Peyvên li jêr di lênûsa xwe de binivîsin.**

**Evîn, jan, negirî, Viyan**
**lale, xemgîn, Wan, keştî**



# ÊKLO DİKLO

Êklo diklo

Du nazê

Şepap repap

Du qazê

Bangê sîrê

Li amêdiyê

Kitik li ber e

Li ber xencer e

Qul qule ye

Çûye der e



# ZAROK Û GUL

Rojekê zarokeke biçûk rastî gulfiroşekî hat. Sorgulek jê kirî, Desmala xwe şil kir. Gula xwe xist nava desmalê û zû xwe gihand malê.  Çawa ku gihîşt malê erd kola û gula xwe çand. Binê wê xepart û av da.

Wê şevê heta sibê gul ji xewna zarokê derneket. çawa ji xewê rabû ranebû, bê pêlav û pêxwas bazda û derket hewşê. Çi bibîne! Dît ku gula wê çilmisî ye. Dîsa binê wê kola û av da. Belê, tu guherîn di gulê de çênebûn.

Zarokê bi rojan ev xebat dewam kir, lê ne gulê serê xwe ji nava axê hilda, ne jî zarok ji wê xebatê bêzar bû. Sibehekê dema zarok ji bo avdanê daket jêr, gulê serê xwe yê sor ji nava axê hildabû û bi rûyekî devliken jê re got:

- Rojbaş!

Zarok ji çav û guhên xwe bawer nekir. Dema ku gula xwe di vê rewşê de dît, ew qas kêfxweş bûbû ku!...

Got:

- Lê te ez pir mijûl kirim, dîsa jî min hêviya xwe ji te qut nekir. Belê te bi rojan serê xwe nîşanî min neda.

Gulê bersiv da û got:

- Rast e. Belê ez dixwazim tu vê bizanî, kêfxweşiyên ku bi hêsanî tên bidestxistin, demdirêj nabin. Ji bo bextewariyê, pêdivî bi kedeke mezin heye.



## Wateya Peyvan

**Bextewar:** kêfxweş, şad, xoşbext
**Ked:** Ji kar û xebata ku di dema kirina karekî de tê kirin re ked tê gotin.
**Xepartin:** Kolana ber qurmê şitil û daran

## Em Têbigihin

1- Çi tiştî zarok mijûl kir?
2- Di dawiyê de gulê xebata zarok bi çi xelat kir?
3- Ji bo bextewariyê, pêdivî bi çi heye?

## Rêziman

1-"Zarokê ji çav û guhên xwe bawer nekir." Kîjan navên di hevokê de xwerû hatine nivîsîn?

ji navên ku ji peyveke resen pêk tên, pêşgir û paşgiran nagirin re, **navên xwerû** tê gotin.

2- Benda destpêkê careke din bixwînin.

-Di wê bendê de çend hevok hene?

-Tîpa destpêka hevokê, bi tîpeke çawa hatiye nivîsîn?

-Li dawiya hevokan, kîjan nîşane hatiye danîn?

-Di hevoka benda dawiya nivîsînê de bêhnok li kû derê hatiye danîn?

## HÎNDARÎ

1- Bûyereke ku we kêfxweş dike, binivîsin.
2- Ji bo zû û rast xwendina mijarê bixebitin.
3- Ji dûrahiya di navbera pirtûk û çavên xwe de baldar bin.

# BIHAR Û ENDÎWER

Bi rê de ber bi Dêrikê ve diçûm, di rêwîtiyê de komek zarokên ku li ser waneya zimanê kurdî dixebitîn bala min kişandin. Pir kêfa min ji wan re hat. Hema wilo min jî ji wan pirsî: çend werzên salê hene, hûn dikarin bi kurdî ji min re bêjin? Piştî ku gotin: havîn, payîz, zivistan û bihar. Min dîsa ji wan pirsî, demsala herî xweş ku jê hez dikin kîjan e? Gotin: Bihar e û em piranî bihara xwe li seyrangehên Endîwarê derbas dikin.

Paşê min xwest bizanim ka wê çi bersivê bidin min, ji bo çi hûn ji demsala biharê hez dikin?

Gotin: çawa em jê hez nekin? Piştî zivistana reş û dirêj, sar û seqem êdî dinya kirasekî nû li xwe dike. Xweza weke şemamokekê tijî hezkirin dibe, her der xemleke nû li xwe dike; dar û devî, mêrg û kanî, deşt û zozan dixemilin. Kulîlk vedibin, avên robaran xweş diherikin, dengê çûk û bilbilan guhên me bi awazên xweş şa dikin, em jî bi wê coş û kelecana biharê, bi dengê def û zirnê,



heyranok û payîzokan derdikevin geşt û seyranan.

- Hûn piranî diçin kû derê geşt û seyranê?

Ji nava wan, yekî çavreş, bejinzirav, porxelek li min nêrî, piçekî keniya, pozê xwe paqij kir, paşê li hevalên xwe nêrî û berê xwe da min:


- Em diçin Endîwerê. Ne tenê em, piraniya gelê herêma Cizîrê ji bo ger û geştê tên Endîwerê.  Ji ber ku Endîwer seyrangeha herî xweş û bicoş a Kantona Cizîrê ye.

Dema ev got min mereq kir û min pirsek din li pirsên xwe zêde kir:

- Çi li Endîwerê heye? Heta ku Wisa bala ger û geştyaran dikêşe?

Vê carê jî keçikekê hema bêje temenê wê ji hemûyan mezintir û hinekî qelew, lê qelewbûneke şirîn ku berçavkek li ber çavan bû, bersiva min wiha da:

- Ji ber ku dema em diçin Endîwerê, ne tenê Pira Bafirê û Ava Mezin, Kêmek jî be di nav têlên sînor re em Cizîra Botan, meskenê Melayê Cizîrî  û warê Mem û Zînê dibînin. A din jî, em dotmam û pismamên xwe yên ku bi sînoran ji me hatine qutkirin, ji dûr ve dibînin.



## Em Têbigihin

1- Li gorî mijarê çûyîna seyranê di kîjan werzî de xweştir e?
2- Çi xweşbûna seyrana li Endîwerê heye?

## Rêziman

Ji peyvên ku li şûna navê kesan tên bikaranîn re "cînavkên kesane " tê gotin.

Cînavkên kesane yên xwerû: ez, tu, ew, em, hûn, ew

Mînak:

**Ez** çûm gund.
**Tu** kar dikî.
**Ew** hat malê.
**Em** diçin Endîwerê.
**Hûn** diçin kû derê geşt û seyranê?
**Em** Cizîra Botan dibînin.

## HÎNDARÎ

1-Hûn bêhtir ji kîjan demsalê hez dikin? Li ser wê di refê de axaftinekê bikin û di dema axaftinê de xalên li jêr li ber çavan bigirin:

-Dema hûn diaxivin tena bin, tengezar nebin.
-Bi dengekî ku her kes bibihîze biaxivin.
-Bi awayekî zelal û vekirî bipeyîvin.

## ÇEND ŞÎRETÊN XANÎ

Ehmedê Xanî wêjevan û fîlosûfê kurd ê navdar, di navbera salên (1661 – 1707 Z) de jiyaye. Weke rewşenbîr û ronakbîrekî kurd, hewl daye ku riya xelasî û serfiraziyê nîşan bide, lewra baweriya wî, ew bû ku gelê kurd ne kêmî miletên din e, ji bo vê jî dibêje:

Kurmanc ne dê pir bê kemal in
Ema dê yetîm û bê mecal in
Bilcumle ne cahil û nezanin
Belkî bê sefîl û bê xudan in



Her wiha gelekî baweriya wî bi zanistê dihat. Weke riya xelasî û gihiştina pileya herî baş a rûmetê didît, ji ber vê yekê di Nûbihara Biçûkan de, zarokan ber bi zanînê û perwerdeya rast dibe. Her tim ji wan xwestiye ku ji bo hînbûn û zanînê bixebitin. Da ku her tim dilê wan xweş be, ji ber ku mirovê dilbiken û vehistî tu caran nabe bextreş.

Her çi bi ilim cehil kir mubedel
Sifirê xwe wî kir bi zêr mukemel



## Wateyên Peyvan

**sefîl:** Belengaz, feqîr, reben
**sifir:** Kanzayeke (nihas)
**Nûbihara Biçûkan:** Navê pirtûkeke Ehmedê Xanî ye.

## Em Têbigihin

1-Li gorî mijarê Ehmedê Xanî di navbera kîjan salan de jiyaye?
2-Ehmedê Xanî çi şîret li zarokan kir?
3-Dema hûn dixebitin, çima dilê we xweş dibe?

## Rêziman

1-Çi têkilî di navbera wateya peyvên li jêr hatine nivîsîn de heye?

bext - bextiyar
xebat - xebatkar
dil - dildar
evîn - evîndar

## XEBATÊN NIVÎSÎNÊ

Peyvên li jêr, bi awayekî rast di lênûsa xwe de binivîsin.

al, baş, cam, dûr, ol, fil, gul, hat, jiyan, kum, law, mûm, man, ode, pak, Rêzan, sûr, tav, wan, yek, sil



# VEGERA LEGLEGAN

Bihar hatibû, derdor şîn bûbû; daran kulîlk dabûn. Li ber deriyê mala Serdarî zerebiyek kevnar hebû. Dema ku dibû dema hatina leglegan kevnebiya me ji rengekî diket rengekî din û dicoşiya.

Sibehekê dayîka Serdêr, bi dengê bilind got:

-Mizgînîîî, mizgînî! Legleg hatine! Kurê xwe ji xewê şiyar kir. Serdar bezî ber kulekê. Di hêlîna li ser dara biyê de du legleg hebûn. Bêhnekê li leglegan nêrî, piştre, li dayîka xwe zivirî û jê pirsî:

-Dayê, çima payîzê legleg van deran berdidin û diçin? Ma ew qas ked ne ziyan e?

Dayîk:

-Ma çi bikin kurê min? Zivistanê li van deran nikarin xwarinê peyda bikin.

Serdar:

-Eger wisa ye, bila li wan welatên germ ku diçinê, bi cih bibin.

Dayîk:

-Ji bo zêdebûn û hinek sedemên din tên van deran. Havînê ew der pir germ in. Çêlikên ji hêkan derdikevin, xwe li ber wê germahiyê nikarin bigirin. Dema bihar tê, mar, beq, kurm û marmarîşok pir tên dîtin. Legleg çêlikên xwe bi wan xwedî dikin.

Dema digihin van deran, berî her tiştî dest bi çêkirina hêlîna xwe dikin. Piştre leglega mê hêkan dike,kurk dibe û li ser hêkan rûdine.

Dema çêlik derdikevin, rojên destpêkê, dê û bavê wan, wan xwedî dikin. Bi salan e, ez vê rewşê temaşe dikim. Çêlikên leglegan, her ku dayîka xwe dibînin nikilên xwe ber bi jor ve vedikin û bê navber xwarinê dixwazin. Dayîkê gotina xwe berdewam kir:

-Têr dixwin û mezin dibin. Per û baskên wan bihêz dibin. Fêrî firînê dibin. Payîzê, bi dê û bavê xwe re derdikevin rêwîtiyeke dûr û dirêj.



## Wateyên Peyvan

**Zerebî:** Dara biyê ya zer
**Kurk:** Qurp, qup, rewşa ku balinde dikevin tê de ji bo çêlik derxistinê
**Bask:** Çeng, per
**Çêlik:** Têjik

## Em Têbigihin

1- Zerebiya li ber deriyê malê kengî dicoşiya?
2- Legleg payîzê diçin kû derê?
3- Legleg û çêlikên xwe, xwe bi çi xwedî dikin?

## Rêziman

ji peyvên weke"ma, qey" re,peyvên "pirsyarî" tê gotin.
Mînak:
Ma ew qas ked  ne ziyan e?
Ma çi bikin kurê min?
Qey Zîlan li gund maye?
Qey te pênûsa xwe winda kiriye?
Em  ji bîr nekin ku li dawiya hevokên pirsyarî pirsnîşanê(?) bi kar bînin.
Peyvên "gelo, çawa" jî pirsan pêk tînin. Hûn jî wan di hevokan de bi kar bînin û  di lênûsa xwe de binivîsin.

## HÎNDARÎ

1- Li gorî vê mijarê, tiştên ku we li ser jiyana leglegan nasî bi çend hevokan, di lênûsa xwe de binivîsin.

2- Sê kes mijarê bixwînin. Yek agahiyên di nivîsê de, yek gotinên Serdarî, yek jî gotinên dayîka wî bixwînin.
3- Bêyî ku hûn li nivîsê binêrin, li hevalê xwe yê ku mijarê dixwîne, guhdar bikin.

# Xecxecok

Xecxecokê xecxecokê
Xweştir ji bîna bîhokê
Rû gewez ji pencê rokê
Tu jîndarî gelo bo kê?!



Xecxecoka evîndara
Pêşkêşa destê dildara
Sebra li ber dilê yara
Xecxecokê xecxecokê

Diyar bûyî bi nazdarî
Bi rengê sor hewesdarî
Kê te çêkir bi nîgarî
Xecxecokê xecxecokê

Birîndar im birîn kûr e
Dikim hawar gazî dûr e
Ji ber te dil arê gûr e
Xecxecokê xecxecokê

***Seydayê TÎRÊJ***

/

## TEST 4

**1- Bersiva rast hilbijêrin.**

. a- Kîjan hevoka li jêr, hevoka pirsyarî ye?

1- Ma ev qas ked ne ziyan e?

2- Hêlînên xwe çêdikin?

3- Serdar bezî ber kulekê?

b-Nivîskarê helbesta xecxecokê kî ye?

a)Seydayê Tîrêj b) Nalî C) Ehmedê Xanî

2- Di hevoka "ji nava wan yekî çavreş bejnzirav porxelek li min nêrî." de çend bêhnok hatine bikaranîn?

a) 3 b) 2 c) 4

**3- Dara Gûzê bi qasî çend metreyan dirêj dibe?**

a) 10-35 b) 53-55 c) 33-50

**4- Di mijara" Vegera Leglegan" de, di kîjan demsalê de legleg tên welatê me?**

a) Zivistanê b)Havînê c) Biharê

5- ji vebijêrkên li jêr kîjan cînavkên xwerû ne,

a) Ma, qey

b) Ez, tu, ew

c) Ên, an

# BEŞA 5

## MEHABAD



Ez bajarekî şirîn im
Ji dozê re evîn im
Gelek mêrxas û egîd
Mîr û gernas û reşîd
Li ser min hatin kuştin
Kovan di dil de hiştin
Bi xwîn xemlandî me ez
Serbilind im bi wan ez
Hêmin, Hejar û Qazî
Perwerandin bi nazî
Diya azadîxwazan
Rewşenbîr, helo, bazan
Xemla min e "Çarçira"
Tê de tev xuşk û bira
Rakir ala rengareng
Hemû yek dil û yek deng
Ey reqîb xwendin bi ceng
Bilind meqam û berjeng
Min deng veda cîhanê
Komara Kurdistanê



MEHABAD

## Wateya Peyvan

**Doz:** Şop, rê, xet, xwestek
**Gernas:** Egîd, mêrxas
**Kovan:** Xemgîn
**Per:** Bask
**Rewşenbîr:** Ronakbîr
**Helo:** Cûreyeke teyran e, baz

## Em Têbigihin

1-Mahabad li kîjan hêla Kurdistanê ye?
2-Di helbestê de çi bû xemla Mehabadê?
3-Mahabadê bi çi navî li cîhanê deng veda?

## Rêziman

"Kurdistan, Çarçira, Hêmin, Hejar, Qazî" navên taybet in. Lewre bi tîpên mezin hatine destpêkirin.

## HÎNDARÎ

1- Helbestê bê deng, piştre jî bi dengekî bilind bixwînin. Heya hûn bi awayekî rast û bi wate dixwînin vî karê xwe bidomînin.

2- Helbestê ji ber bikin û li pêşiya refê bixwînin.

## XIFŞÊ

Xifşê karika xezaleke pir ciwan bû. Wê şevê nû, ji dayîk bûbû. Li cem dayîka xwe razayîbû. Kêvroşkek ji wir de hat û jê re got:

-Rabe Xifşika delal!

Xifşê karikeke pir nazdar bû. Destpêkê çavekî xwe, paşê jî yê din vekir. Dema xwest rabe ser lingên xwe, lerizî û ket.

Kêvroşk têr pê kenî.

Kêvroşk:

-Tu çi qas giyandareke şirîn î!

Dema mirov li gel yeke weke te bijî, tu carî ji giyanê xwe bêzar nabe. Ma ne wisa ye? Xifşê bersiv neda. Gelekî westiyabû.

Kêvroşkê, zêde xem jê nexwar. Ji ber ku dizanî, wê rojekê Xifşê mezin bibe û bi wan re bibe heval.



Şevek di ser jidayîkbûna Xifşê re derbas bû, fêrî rêveçûyînê bûbû. Her tiştê ku didît, bala wê dikişand û şaş dibû.

Kêvroşk jî, ji bo Xifşê dibû alîkar.

Kêvroşk:

-Ev lawir, navê wan kew in, çi qas xweşik in, ma ne wisa ye?

Xifşê:

-Lê ev çi ye? Ma ev jî kew e?

Kêvroşk:

-Na, ev perperîk e.

Xifşê:

-Perperîk e!

Dubare kir û dema kulîlka sosin dît, digot qey ew jî perperîk e.

Kêvroşk, gelek bi wê kenî û got:

-Tu dîsa şaş bûyî, ev kulîlk in.

Xifşê, bi dengekî pir ji dilê xwe got:

-Nexwe, ji hemû kulîlkan re rojbaş!

Her ku roj derbas dibûn, Xifşê fêrî tiştên nû dibû. Di dawiyê de bû xezaleke daristanê ya pir mezin û xweşik.

## Wateya Peyvan

**Xifş:** Karxezal
**Giyan**: Can, rewan

## Em Têbigihin

1-Di mijarê de karika xezalê çawa hatiye pesndan?
2-Kêvroşk çima bi xifşê kenî?
3-Çîrok li ku derê diqewime?

## Rêziman

1- Van peyvên li jêr, li gorî rêzetîpan rêz bikin.
Xem – xweş – kew – kar – xezal – roj – xifşê
2- Di zimanê Kurdî de "***tir***" û "***tirîn***" payeya di navbera heyînan de dipîve.
**Mînak: Sor – sortir – sortirîn**

## HÎNDARÎ

1- Di televîzyonê de, bûyerên di navbera lawiran de derbas dibin, guhdar û temaşe bikin. Di dema guhdarkirin û temaşekirinê de li ser van xalan baldar bin:
-Di belgefîlmê de kîjan lawir cih digirin?
-Taybetmendiyên lawirên di fîlmê de cih digirin, çi ne?
-Belgefîlmeke ku lawiran şîrove dike, ji bo hevalên xwe vebêjin.
-Belgefîlma ku we şîrove kirî, bi çar-pênc hevokan binivîsin.
2- Dema ku hûn mûzîkê guhdar dikin, an jî fîlman temaşe dikin, tu kesî bêzar nekin.

## ROVÎ Û GUR

Hebû tunebû, ji Yezdan gewretir tunebû. Dibêjin demekê roviyekî pir xwedî dek û dolab hebû. Sal çûn, dem derbas bûn, roviyê fêlbaz, lewaz û nexweş bû. Sibehekê zû li rex goleke avê, li nêçîrê digeriya. Ji nişka ve gurekî birçî derket, êrîşî roviyê nexweş kir ku wî bixwe. Roviyê nexweş rûnişt û dest bi girî kir û got:

- Ez nakevim xema ku tu min bixwî! Bihêle, ez cara dawî kudikên xwe bibînim. Paşê tu min bixwî jî xem nake.

Gurî ji rovî pirsî û got:

- Ma tu vê sibeha zû li ser vê gola sar çi dikî?

Rovî got:

- Ez hatibûm nêçîra masiyan. Ev karek pir asayî ye, ez ê nîşanî te jî bidim. Heya ez biçim kudikên xwe bibînim û bêm, tu yê jî çend masiyan bigirî.

Gur:

- De zû nîşanî min bide, da ez jî çend masiyan bigirim.

Rovî:

- Li ser keviya golê rûne. Dûvê xwe dirêjî nava avê bike. Heya demekê dê masî bên û bi dûvê te ve daliqin. Dûvê xwe ji avê bikişîne. Çend masî wê bi dûvê te ve derkevin ser bejahiyê. Di wê demê de tu yê masiyên xweş û paqij bixwî.

Gur li ser keviya golê rûnişt û dûvê xwe weke ku rovî gotî dirêjî nava golê kir, da ku masiyan bigire.

Ji rovî re got:

- Here kudikên xwe bibîne û zû were!

Roviyê fêlbaz jî, ber bi gundekî têr kûçik ve çû. Xwe nîşanî kûçikên gund da. Kûçikên gund hemûyan bi hev re êrîşî rovî kir. Rovî ber bi golê ve revî. Wê sibehê gelek sar bû. Gol qerisî bû. Dûvê gur jî di nava qerîsokê de asê mabû. Rovî silav li gur kir û got:

- Tu çi dikî mamê gur?

Gur:

- Tu dizanî, ez masîgir im.

Rovî:

- Ma bavê te masîgir bû, Ma bapîrê te masîgir bû?!

Şûna ku kûçik biçin rovî, çavên wan li gur ket û êrîşî gurî kirin.



## Wateya Peyvan

**Gewre:** Mezin
**Fêlbaz**: xapîner

## Em Têbigihin

1- Rovî, li ber gola avê li çi digeriya?
2- Rovî, nêçîra masiyan çawa nîşanî gurî kir?

## Rêziman

Li dawiya hevokên li jêr, kîjan nîşane tên danîn?

*Xal (.) Pirsnîşan (?) Baneşan(!)*

-Roviyê nexweş rûnişt û dest bi girî kir
-Here kudikên xwe bibîne û zû were
-Tu çi dikî mamê gur

## MIJARA SERBEST

### BILBILÊN DI RIKEHAN DE

Rojek ji rojên payîzê bû. Pîremêrek di destê wî de gopal, hêdî hêdî di rê de diçû. Dît ku zarokek ber bi wî ve tê. Di destê zarok de rikehek û di rikehê de du bilbil hebûn. Bilbilan, rikeh dida ber nikilan û hewl didan ku xwe derxînin. Pîremêr, li ser vê rewşa bilbilan, pir dilteng bû. Piştre ji zarok pirsî:

- Tu yê bi kû ve herî?
- Ez ê herim bazarê û van bilbilan bifiroşim.
- Baş e, bifiroşe min. Ez ê van bilbilan bikirim. Tu nafiroşî min?
- Belê, çima nefiroşim?

Pîremêr, ji bêrîka êlekê xwe pere derxist û da destê zarok. Rikeh ji destê zarok girt. Destpêkê bilbilek ji rikehê derxist. Piştî demekê destê xwe li ser perên wî gerand û berda. Bilbil ji nişka ve, çengê xwe vekir, bi şahî dest bi firînê kir. Heman tişt ji bo bilbilê duyem jî kir.



Li ser vê yekê, zarokê biçûk matmayî mabû. Zarok, carekê li pereyên di destê xwe de, carekê jî li pîremêr mêze kir û piştre jê pirsî:

- Çima te wisa kir mamo! Çima te bilbil berdan?

Pîremêr kenî û wiha bersiv da:

- Binêre lawê min, berî çend salan şoreşeke çekdarî çêbû. Ji bo ku em welatê xwe, ji bin destê neyaran derxin, me şer dikir. Aha di wî şerî de, ez birîndar bûm û dîl ketim destê neyaran. Her wekî van çûkên di destê te de bûm. Ji bo ez rizgar bibim, min jî her tim hewl dida. Weke ku dilê min dixwest, min nedikarî tevbigerim. Dîlî û bindestî, tiştekî gelek zor û zehmet e!

Pîremêrî bi çavên xwe yên şil axaftina xwe berdewam kir.

- Tu dizanî, çima min bilbil serbest berdan? Ew ne çûkên rikehan in. Çawa dixwazin bila wisa bifirin. Dixwazin li ser çi rawestin, bila rawestin. Bila ji dîliyê rizgar bibin.

# KULÎLK

Dayîka min nexwendibû. Lê xwedî hesteke erênî û zanîneke pir mezin bû. Ev hesta erênî û zanîna xwe, ji xwezayê girtibû. Hemû dayîkên cîhanê mirovên herî baş û pîroz in.

Rojekê min ji baxçe, kulîlkek çinî û ji bo dayîka xwe anî. Dayîka min pir dilşad bû.

Dayîka min got:

- Ka em hinek kulîlkên din jî biçinin.

Em çûn nav baxçe. Kulîlkek nîşanî min da û got:

- Lê binêre lawê min, ev kulîlk çi qas xweşik e. Ev kulîlk jî giyandar in. Giyanê wan jî heye. Eger em jê bikin, dê rebenan bimirin. Her kulîlk bi tayê xwe ve xweşiktir radiweste.

Li ber serê her kulîlkekê rawestiya û ji min re got:

- Ger dilê te ragire, tu dikarî jêkî.

Çi taybetiyên min ên baş hebin, ez deyndarê dayîka xwe me.



## Wateya Peyvan

**Reben:** Belengaz, jar
**Giyandar:** zindî, birih

## Em Têbigihin

1- Nivîskar, di benda mijarê ya yekem de, kîjan taybetmendiyên dayîka xwe vedibêje?
2- Zarok, rêz û hezkirina xwe di kîjan hevokan de, ji bo dayîka xwe diyar dike?
3- Dayîkê li ser mijara kulîlkan, bi çi awayî kurê xwe şiyar kir?

## HÎNDARÎ

1- Her dem em rêzê ji bo dayîka xwe digirin. Sedema vê çi ye? Bi çend hevokan diyar bikin.

2- Li ser vê gotinê, nivîsekê binivîsin. “Her kulîlk bi tayê xwe ve xweşik e.”



## XWENDIN

*Xwendin nebe kes naçe pêş,*
*Peyda dibin pir derd û êş,*
*Her dem dibin destê neyar,*
*Em dê bidin xukî û bêş.*

*Her çi nexwendî rêncber e,*
*Yê ku bixwîne rêber e,*
*Her dem di nav xan û sera,*
*Serkare, ew ya serwer e.*

*Xwendin divê hem pir xebat,*
*Bo miletê Kurd û welat,*
*Kurdno ji xew rabin hemû,*
*Mizgîn li we roja me hat*

*Cegerxwîn*

## Wateya Peyvan

**Xukî:** Bac, qemçûr
**Bêş:** pereyên ku kesek bêyî bedel dide kesekî din
**Xan:** Avahî, koçk
**Serwer:** Rêber
**Tac:** Kumê serê qiral û qiralîçeyan

## ALÎKARÊN COTKAR

Rojek ji rojên biharê bû. Di mêrgê de hesp, ker, ga, çêlek û mih diçêriyan. Di navberekê de hemû hatin rex hev. Giyayê vê mêrgê hêj ter û şîn bû. Hespî, beriya hemû lawiran mafê axaftinê yê xwe dît. Şihiya û got:

- Yê ku jin, zilam û zarokan li ser pişta xwe digerîne, dibe bazarê û tîne, ma ne ez im? Dema ku karek lezgînî çêdibe, ma ne min dibezînin?

Li ser van gotinan, heya ji kerê hat ziriya û got:

-Di vê derê de jî serdestî? Her roj li ser rêya di navbera gov û bazarê de temenê min tê mezaxtin. Ji malê re çi bê kirîn, ez dikişînim. Birayê hesp! Ev jî ne bes e, car caran ceh û xwarina te jî bi min didin kişandin. Tu raweste, destpêkê ez ê vî giyayî tam bikim. Maf ê min e.

Ga, wekî ku bêje çênabe; serê xwe yê mezin rakir û oriya:

- Dema ez hebim, dora xwarinê nabe ya we? Aboriya jin, zilam û zarokan li ser min e. Eger ez di zeviyan de nîr û haletê nekişînim; genim, ceh û zerzewat ma dê bên çandin? Ji ber vê yekê, ez dibêjim xwarina vî giyayî mafê min e.

Çêlekê, bi çavên xwe yên mezin, tewş li hemûyan mêze kir. Ji devê wê gilêza weke benikê têran diket û got:

-Moooo! Şîrê ku jin, zilam û zarok vedixwin, ez didim. Ma tenê şîr? Nîvişk û penîr jî ji şîrê min çêdikin. Pêwîst e, destpêkê ez vî giyayî bixwim.

Dîk, mirîşk, pisîk, se û mih jî piştî demekê tevlî vê gotûbêja germ bûn. Her yekî digot: sûda min ji bo cotkarî zêdetir e. Cotkar, li binê mêrgê rûniştî bû, li wan guhdar dikir û got:



-Hûn hemû sûdên cuda cuda didin me. Ji ber vê, ez we tevan xwedî dikim. Têra we tevan xwarin û cihê razanê jî heye. Hûn tev jî wekhev in.

Dilê hemû lawiran bi gotinên xwediyê xwe xweş bû û gotûbêj bi dawî bû. Hemûyan bi hev re dest bi xwarina giyê kir.

## Wateya Peyvan

**Zerzewat:** Bêzûr, şînatî
**Mezaxtin:** Xerçkirin
**Têr:** Ji bo barê hêstir, ker û hespan çûwalên bi rîs hatîn çêkirin.
**Şihîn:** Hîrîna hêstir, mehîn û hespan
**gotûbêj:** danûstendin, nîqaş
**Gov:** Xan, axur

## Em Têbigihin

1- Çima pêwîstiya cotkarî bi hemû tebayan heye?
2- Çima hesp mafê xwarinê yê xwe dît?

## Rêziman

1- Navên li jêr **taybet** in, yan jî **giştî** ne? Çima?
***Çêlek, dar, cotkar, mirîşk***

2-"**Xwarina giya mafê min e.**" Di vê hevokê de peyva "giya" navekî giştî ye. Sedema vê çi ye?
Ji ber ku gelek cureyên giya dide nasîn.

3- Di mijarê de çend bend cih digirin? Bend çawa hatine diyarkirin?

## HÎNDARÎ

1- Hûn dixwazin di bêhndana havînê de çi bikin? Ji bo hevalên xwe bêjin.

2- Demeke xwe, ya we xweş borandî, bi çend hevokan binivîsin.

3- Vê çîrokê zindî bikin.

## HEZKIRINA DAYÎKÊ

Du zarokên dayîkekê hebûn. Li derdora wê bi kêf û şadî rûniştibûn. Dema ku bi kêf û şadî li derdora dayîka xwe rûdiniştin, dayîka wan hezkirina xwe nîşanî ya biçûk dida. Ji ber vê yekê, zaroka din a mezin xemgîn dibû û hest pê re çêdibû ku dayîka wê ji wê hez nake. Lewma carekê dixwaze hestên xwe bigihîne diya xwe û jê re dibêje :

- Dayîka min a delal! tu nizanî ez çi qas ji te hez dikim. Gelo tu jî ew qas ji min hez dikî, an na?

- Ji bo çi qîza min, çawa ji te hez nakim?

- Ji ber ku zarokên te du ne. Dilê te bi hezkirina du kesan lê dide. Lê di dilê min de tenê dayîkeke delal heye; ew jî tu yî û ez pir ji te hez dikim dayê.

- Dayîk: Keça min î delal, hezkirina min ji we tevan re yek e.



## Wateya Peyvan

**Delal:** Xweşik, ciwan, spehî, rind

## Em Têbigihin

1-Çend zarokên dayîkê hene?
2-Çima zaroka mezin dihizirî ku dayîka wê jê hez nake?

## Rêziman

Di hevoka jêr de kîjan peyv çawaniya dayîkê diyar dike, bibînin.

"Dayîka delal tu nizanî ez çi qas ji te hez dikim."

## HÎNDARÎ

1- dema hûn yekem car kesekî bibînin, pêwîst e hûn çawa xwe bidin nasîn?
2- Pêwîst e hûn kîjan pirsan jê bikin?
3- Pêwîst e hûn bersivên çawa bidin pirsan?

# KEW Û MIRÎŞK

Roviyekî daholek kir stûyê xwe, li ber kuna xwe rawestiya. Li dahola xwe xist û got: "xeberekeee mezin... dîlanekeee giran, lîstokêêên mişkan, şerêêê kîsoyan, stranêêên şalolan... Rabiiin, rabin! Vê rasthatiya dewlemend û rengîn winda nekin, werin werin... (diiing û ding... diiing û ding) derbasbûna mirîşkan belaş e. Rabiiin... rabin!"

Kew û mirîşk li vî dengî rast hatin, kewê ji mirîşkê re got: "Were, em derbasî vê dîlanê bibin, ji ber ku bê pere ye." Gava derbas bûn, rovî got: "de werin, werin, ez we bixwim. Hûn ketin davika min."

Kew û mirîşkê dest bi girî kir û li ber rovî geriyan, gotin: "apê rovî de li me bibore!"

Rovî: "Îro xem nake, taştê û şîva min heye, ez ê sibê we bixwim." Rovî kevirek danî ber kuna xwe û çû gerê.

Kew û mirîşkê bi nikilên xwe kevir gêr kir, derketin û reviyan. Vê carê mirîşkê ji kewê re got: "Êdî em nayên xapandin." Her yekê berê xwe da lîsê xwe.



## Wateya Peyvan

**Dewlemend:**Zengîn
**Lîs:** Lûs, cihê kew û mirîşkan

## Em Têbigihin

1- Kew û mirîşk ji ber çi derbasî dîlanê dibin?
2- Rovî çima kew û mirîşkê naxwe?
3- Kew û mirîşk çawa ji destê rovî rizgar bûn?


## TEST 5

**1- Vê benda li jêr bixwîne û li gorî wê pirsan bibersivîne?**

"Mirovên bi tendurist, xwedî hêz û daxwaz in. Asayî dihizirin û dixebitin. Mercê bextiyariyê yê herî girîng, bedenekî tendurist e. Ji ber vê jî destûra bingehîn hêsanî tîmarbûn e, duyem li gorî pêwîstiya laş razan e, sêyem li ser paqijiyê baldarbûyîn e, ya çarem jî werzîşkirin e."

1- Mirovên bitendurist, xwedî kîjan taybetmendiyan in?

2- Valahiyên li jêr li gorî bendê temam bikin.




**2- hevokên rast bi tîpa (R) û yên şaş bi tîpa (Ş) nîşan bikin?**

- Nîşaneya hevoka pirsê ev e (!). ( )
- Wateya peyva dewlemend, zengîn e. ( )
- Çêlek, dar, mirîşk ji navên giştî ne. ( )


Deryay Reş
Gurcistan
Rûsya
Ermenistan
Azerbeycan
Nahçevan
Turkîya
KURDISTAN
Îran
Sûrya
Îraq
Libnan
Deryay Sipî
IDIR
Qers
Sewas
Erzincan
EZEROM
Agrî
Bazîd
Mako
Caldiran
Dersîm
Cewlik
Elezîz
Mûş
Tetwan
Wan
Qotûr
Xoy
Elbistan
Meletî
Farqîn
Bitlîs
Firat
Semsûr
AMED
Batman
Sêrt
Başqela
Gever
Meras
Besnî
Siverek
Merdîn
Şirnex
Clemerg
Wirmê
Zaxo
Weranşiher
Nisêbin
Cizîr
EFRÎN
Entap
KOBANÊ
Riha
AMÛDE
DIRBASIYÊ
QAMIŞLO
DERIK
Dicle
Dihok
Nexede
Mihabad
Iskenderûn
Heseke
Mûsil
Hewler
Bokan
Seqiz
Bîcar
Kerkuk
Silêmanî
Merîwan
Sine
Helebce
Qesrî-Sirin
Kirmaşan
Xaneqîn
Ilam